Jemal Nebez Foundation

Dezgeha Cemal Nebez

Komîsyona Xelata Cemal Nebez

Ser bi dezgeha Cemal Nebez, Berlîn – Almanya ye

Der barê biryara Komîsyonê ya taybet bi xelata 2023 de ku xelata yekem e,

Komîsyonê bi yekdengî biryar da ku xelata sala 2023 bide ZARA MIHEMEDÎ ku li bajarê Sine dijî. Me ew biryar bi awayekî serbixwe daye. Ev biryar piştre ji aliyê lijneya rêveberiyî ya dezgehê ve hat qebûlkirin.
Niha komîsyona xelatê vê daxûyanê belaw dike.

MS ZARA MOHAMMADI

خاتوو زارا محەمەدی

XANIM ZARA MIHEMEDÎ

Komîsyona Xelata Cemal Nebez ku girêdayî Weqfa Jemal Nebez a li Berlînê ye, ji bo rêzgirtina xebatên wê yên bêwestan ên xwebexş ji bo hînkirina zimanê kurdî, parastina mafê bingehîn ê zimanê dayikê û têkoşîna li dijî înkarkirina nasnameya kurdî, biryar da ku xelata xwe ya yekem pêşkêşî XANIM ZARA MIHEMEDÎ bike. Zara di nav rewşa dijwar a Kurdistanê de ku ziman û nasnameya wê hatiye astengkirin, bi salan rê û rêbaza xwe parastiye ligel hevkariya rêxistina sivîl, Nûjînê.

Tevî tundûtîjiyên giran, cezayên bêdad û girtîgehê, Zara Mihemedî bi eşkereyî li qada giştî li dijî neheqiya zimanî û nasnameyî derketiye. Bi vî awayî di hişyarkirina li hemberî vê neheqiyê de li hundir û derveyî Kurdistanê roleke girîng lîstiye. Têkoşîn û helwesta wê bandorek mezin kiriye û ji gelek ciwan û jinên kurd re bûye sembol û îlham. Em weke Komîsyona Xelata Jemal Nebez bi kêfxweşî û serbilindî xelata xwe pêşkêşî ZARA MIHEMEDÎ dikin.
Bi rêya malpera Weqfê, em ê we agahdar bikin derbarê hûrguliyên taybet ên pêşkeşkirina vê xelatê de.

Haci Akman
Profesor
Beşa Arkeolojî, Dîrok, Xebatên Çand û Olî
Zanîngeha Bergenê,
Norwêc
Li ser navê Komisyona Xelata Jemal Nebez (Berlîn, Almanya)
Roja 21, 2023

Jemal Nebez Stiftung
Spichernstraße 15
10777 Berlin, Germany